Ahenga Dêrika Hemko

Bi helkeftina sala nû, rêxistina Dêrikê ya PARTIYA YEKÎTÎ YA Demoqrat a Kurd li Sûriyê (YEKÎTÎ) ,çavdêriya şevbiwêrkekê kir, ya ji bal koma Dêrika Hemko ya folklorî hatî li darxistin, di wê şevê de, Komela ciwanên Kurd hatibû vexwendin, û bi beşdariya hin girûpên çandî wek :

1-Girûpa çanda kurdî li Dêrikê .

2-Tevne çand û huner.

3-Saziya parastin û fêrkirina zimanê kurdî li Sûriyê.

4-Baxên jinên Dêrikê.

Bi jimarek baş ji keç û lawên Dêrikê, şevê dest pêkir, bi rawestanek bê deng li ser giyanê pakrewanên Kurd û Kurdistanê,di peyre bixêrhatina mêvanên şevê hate kirin û koma Dêrikê bi hin çalakiyan rabûn. Wek stirana (ez keçim keça Kurda me) bi dengê (Ahîn). Di peyre komela ciwanên kurd û seyranek di baxên helbesta kurdî de û helbestvan AZAD HEMO û hin helbestên xwe yên nazik û rind û pêre dengê bilûra bi axîn û bizqa delal û awazên naz û tenik şev hate xemlandin. Di peyre hunermendê hêja ISAM EBBAS , ji koma Dêrikê du stiranên xwe diyarî mêvanan kir. Ew jî strana (qamişlo) û strana (tu li kû ma).

Hêjayî gotinê ye ku hin ji mêvanên şevê helbestin xwe pêşkêşî beşdaran kirin.Li dawiya ahengê, darêjkirina gato ji bal nûnerên girûpên çandî ve hate birîn û hin dan standin li ser helbestên AZAD hatin bikaranîn . Di peyre strana (ey lê gulê gula minê) bi dengê xortekî hate pêşkêşkirin.Raste şevek bû, lê ewê di bîranînan de geş û ronî bimîne.

Nûnerê weşana NEWROZ ev kurte hevpeyvîn bi hin ji beşdarên şevê re kir, ji wan:

1-M.Qasim: Sipasiyek bi rûmet. Raste çalakiyên bibin sedemên civîna mirovan ji bo dan û standinê ....hemû bi kizwetin û bi mifane.Nerîna min ewe ku ristevan 11 rist xwendin li dû hev me nikarî berbikevin. Hêviyên min gelekin lê ya sereke ewe ku miletê Kurd di sala nû de bi serkeve û li Sûriyê jî (lêvegera) xwe avabike. Weşana NEWROZ weşanek cihê rêz û hurmetê ye ji ber birêveçûna wê ya bê rawestandin.

2-Evîn Şikakî:Silav û rêz, ez gelekî bi vê ahengê kêfxweş im û ev ne cara yekemîne ev xort û keçên hêja bi vî rengê buharî bi cih tînin. Ez destxweşya wan dikim û hêviya berdewamiyê û serkeftinê ji wan re dixwazim. Hêviya min ew e serkeftin û aştî ji kurdan re û çi kesê finda jiyaneke xweş ji xwe re pşêxiştibe, hêvîdar im ew find venemire. Li dawî hêviya serekeftinê ji weşana Newroz re dikim, daxwaza min yekdestiye di xizmeta toreya kurdî de ye.Sala we hemiyan pîroz be.